Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar 1055 | 9-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

## Resmên zodyak û astrolojiya kevnar

**Arkeologên Misrî li Perestegeha Esna ya li Misrê, li ser dîwaran resmên ku bircên zodyakê teswîr dikin dîtin.**

Cihên ku resm lê hatine dîtin nêzî bajarê kevnar Luksorê ye. Zodyak kirin. Her wiha di metnên astrolojîk de jî girîngiya zodyakê zêde bû. Lê li perestgehan kêm caran resmên ku zodyakê hatine dîtin. Ji lewma jî ev resmên nû yên ku hatine dîtin girîng in û beriya 2 hazar salan hatine çêkirin. A rast ev resmên zodyak





di derbarê astrolojiyê de weke salnameyekê ye û xelkê li gor bircên zodyakê di derbarê siberojê de texmînan dikir. Versiyonên zodyakê her çiqas li gor çandên şaristaniyan guherî bin jî heta roja îro hatine. Yanî zodyak pergala stêrk û gerstêrkan e û dema mirov li asîman dinihêre mirov bi zanîna vê pergalê baştir ji astrolojiyê fêhm dike.
Heyamên berê, nexasim jî şaristaniyên kevn ên Misrî ji bo mezel û lahîtên xwe bineqşînin ji zodyakê sûd werdigirtin. Li ser qir û qafên kevnar jî dîsa bircên zodyakê dihatin resm-zûde ye li perestgehê hebûn lê di bin qirêjiyê de nehatine kifşkirin.
Zodyak piştî Misrîyan ji hêla hin dewletên Yewnan jî hate qebûlkirin. Lê di eslê xwe de bingeha zodyakê şaristaniya Babîl e. Lê bi wextê re versiyonên cihê yên astrolojîk ango zodyakê li dinyayê belav bûne û li gor her çandê birc bi sembolên cur bi cur tên temsîl kirin. Resmê ku li Misrê hatiye kifşkirin jî Birca Kevanê temsîl dike û dûva wî jî weke ya dûpişkan e. Her wiha resmê li ser dîwar hatiye dîtin bi rengan hatiye xemilandin. **Yine Ozgur Politika**

## Rengên kûrahiya behrê

**Gelo 6 hezar metroyan di binê behrê de çi heye? Keştiyeke binê behrê ya Çîniyan, di behra Pasîfîka Başûr de li bersiva vê pirsê geriya. Ew daket zemînê geliyê binê behrê yê Kermadesê.**

Encam jiyan li wir jî heye û dibe ku hin ji heywanên dîmenê wan hatiye girtin, em weke mirov nû çav bi wan





dikevin. Lê masiyê bi şewk ê sor ne yek ji wan e. Mirovan ew berê jî dîtine. Lê di kûrahiya 5 hezar û 5736 metreyan de, ev cara ewilî ye mirov wî dibînin.
Ev geliyê binê behrê yê Kermadec, yek ji yên herî kûr ên binê behrê ye. Kûrahiya wî ji 6 hezar metreyan digihîje heta bi 11 hezar metreyan. Lêkolerên Çînî û yên ji Zelandayiya Nû bi hev re vê projeyê bi rê ve dibin. Proje dawiya sala 2022´yan bi rê ve çûye.
Niha, Institute of Deep-sea and Science and Engineering (IDSSE) ya Çînê û National Institute of Water and Atmospheric Research (NIWA) ya Zelandaya Nû ev dîmen eşkere kirin. Di rêwîtiya kûr a pêşî ya 6 saetan de lêkoleran xeyarên deryayê yên weke camê zelal, qelemên deryayê yên gelekî dirêj, marmasiyekî bê rû û axtepotên dumbo dîtin.
Ev tenê yek ji 16 seferên di mohleta du mehan de bû. Di encamê de stêrkên deryayê yên kêmdîtî, mercanên piçûk, masiyê rojê yê mezin, sungerên behrê di kûrahiya 6 hezar û 124 metreyan de jî hatin dîtin. Axir, di kûrahiyên behrê yên giran û bêrohnî de jî jiyaneke pirreng heye. **Yine Ozgur Politika**

## Cotyarek 10 salin li sînorê Çemçemal, ji bo mêşên xwe gulek taybet diçîne

**Cotyarek ji sînorê bajarokê Çemçemal'ê zêdetirî 10 salane, ji bo têrkirina mêşên xwe ku di zivistana sar de kulîlk nagirin, bi çandin û mezinkirina gulekê bi navê Rapis ve mijûl dibe.**



Ciwanê bi navê Osman Elî xelkê bajarokê Çemçemal e. Osman li sînorê Çemçemal mêşan xwedî dike, ji ber ku di zivistanên sar de kulîlk nagirin, ji bo têrkirina mêşên xwe ev 10 salin bi çandin û mezinkirina gulek bi navê Rapis ve mijûle. Osman Elî li ser kar û xebatên ku dike ji Rojnews'ê re axivî.
Osman Elî destnîşan kir ku ev 10 salin bi vê tovê ve mijûl e ku vê tovê ji bo hingivê mêşan diçînin û bi sê curan dikarin biçînin. Ev tov di meha Îlon û Cotmehê de tê çandin, lê Osman di meha Sibatê de tov kiriye û li bendê dimîne ku gul veke."

Di derbarê taybetmendiyên gulê de Osman wiha axivî: "Çiqas sermayek dijwar were jî li berxwe dide û min di warê hingiv de sudek mezin jê girtiye. Sudên wê jî di mêşên me de derdikeve. Ji bo yên bi hêz û bê hêz zû bi hêz dike û xwedî şiliyek zêde ye."

Osman her wiha da zanîn ku ev gulê di destpêkê de li avhewaya sar ya welatên Ewrupayê şînbûye û zêdetirî 10 salane aniye Kurdistanê û ji bo mêşan diçînin û wiha got: "Balkêşe beşek mezin ji cotyaran vê tovê wergirtine. Ji ber nebûna tecrûbeyê, nekarîne carek din tov bigirin, lê berevajî wê ez her sal tovê nû jê digirim û berhev dikim. Min van tovan ji mêşvanek mezin ê Silêmaniyê wergirtibû, lê piraniya mêşvanan ku ji vê mêşvane tov wergirtine ji dest dane, lê yên min parastî mane. Hem ji bo mêşên me hem jî ji bo me sudek mezin dide. Gelek salin min kariye bê beramber tovan bidim welatiyan."

Şêweyê gula Rapis hîn zêdetir bi ser gula xerdelê ya biharê ve diçe. Osman wiha qala cudahiya navbera her du gulan de dike: "Cudahiya wan ewe ku gula me ya xerdelê nêzîkî 15 rojin kulîlk vekirine, lê Rapis min di meha Sibatê de tovê wê çand û piştî 15 roja gul vekiriye. Heta niha jî ku di meha Nîsanê de her gula wê heye. Ev dem ji bo mêşan demek dirêje û sudek baş yê xwe heye." **ROJNEWS**

Sudoku: Bersiv 64

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 8 | 5 | 3 | 1 | 9 | 2 | 6 | 7 |
| 2 | 9 | 3 | 7 | 5 | 6 | 1 | 8 | 4 |
| 1 | 6 | 7 | 8 | 2 | 4 | 3 | 9 | 5 |
| 9 | 4 | 8 | 2 | 6 | 7 | 5 | 1 | 3 |
| 3 | 1 | 2 | 5 | 9 | 8 | 7 | 4 | 6 |
| 5 | 7 | 6 | 1 | 4 | 3 | 9 | 2 | 8 |
| 7 | 3 | 4 | 9 | 8 | 2 | 6 | 5 | 1 |
| 6 | 5 | 9 | 4 | 7 | 1 | 8 | 3 | 2 |
| 8 | 2 | 1 | 6 | 3 | 5 | 4 | 7 | 9 |

Sudoku:Pirs 65

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | | | 5 | 4 | | 2 | | |
| | 1 | | | | | | 9 | |
| | | 5 | | | | | | 8 |
| | | 4 | | 3 | | 1 | 6 | |
| 1 | | 2 | 6 | 7 | 4 | 8 | | 9 |
| | 6 | 3 | | 5 | | 4 | | |
| 9 | | | | | | 3 | | |
| | 3 | | | | | | 5 | |
| | | 6 | | 9 | 1 | | | 4 |

## Quncika Têgînan

| Bender | Keştîgeh, lîman. Berava keştî lê radiwestin. |
|---|---|
| Biha/bihakirin | 1. Bazarkirin: Min solek ji xwe re biha kir, lê min nekirî.<br>2. Nirx, qîmet: Bihayê vê solê çiqas e?<br>3. Giran, zêde: Îsal goşt pir biha ye. |
| Dagîrkirin | Vegirtin: Gundê me dagîr kirin. |
| Danezan | Daxuyanî, beyanname: Di danezanê de gelek bend hene. |
| Derfet | Delîve, imkan. |
| Dersînorkirin | Derxistina kesekî derveyî sînorê welatekî. Almanya gelek koçber dersînor kirin. |
| Jenosîd (Fransî) | Qirkirin, tevkujî, gelkujî. |
| Parze | Dermanê ji bo pêşîgirtina li nexweşiyekê: Ji bo parastina ji nexweşiya sorikê zarok hatin parzekirin. |
| Işkence (Farisî) | Madî yan jî manewî eziyeta zêde: Girtî hatine işkencekirin. |
| Trajedî (Fransî) | Êşa pir mezin. Karesat, felaket. |

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1055 | 9-Nisan- 2023 | www.ronahi.net/ku/

'Armanaca dagirkeriya Tirk qirkirina civaka Êzîdî ye'.R-2

# 'EM Ê BI HEMÛ RÊBAZÊN NÎŞTIMANÎ Û DEMORKATÎK TÊ BIKOŞIN'

Êrîşa dewleta Tirk a dagirker bê navber li ser qadên berxwedanê, başurê kurdistanê, wargeha Ş. Rustem, Şengal û Rojavayê kurdistanê, didomin. Herweha li Bakurê Kurdistanê jî binçavkirin, girtin û pişaftin bê navber tê meşandin. Êrîşa herî dawî ku li ser balefirgeha bajarê Silêmaniyê hatî kirin jî, mirov dikare mîna dewama van êrîşên ku bê navber li ser gelê kurd û vîna wî ya azad bigre dest.R4



# ‘Armanaca dagirkeriya Tirk qirkirina civaka Êzîdî ye’

Jina Êzîdî ya bi navê Lêyla Ibrahîm diyar kir ku welatiyên Kurd yên Êzîdî yên ku li Efrînê mane bi gefa kuştin û işkencekirinê re rû bi rû dimînin û got, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê hewil didin ku Êzîdiyên li Efrînê qir bikin.

**Norşîn Sîno/ Qamişlo**

Ji dema dagirkirina dewleta Tirk û çeteyên wê ji herêma Efrîn re, dagirkerî tevahiya kiryarên dijmirovî yên li dijî welatiyên Efrînê pêk anîn. Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê kuştin , girtin , işkencekirin û tevahiya kiryarên hovane li dijî gelê Efrînê kirin. Di 20 Adarê de ji ber dadana agirê Newrozê 4 Kurdên Cindêrisê ji aliyê komek çete ku girêdayî dewleta Tirk a dagikere hatin qetlkirin.





Herwiha herî dawî di 31`ê meha Adarê de çeteyên bi ser dewleta Tirk ya dagirker ve malbateke kurdên Êzdî neçar kirin ku dest ji ola xwe berdinn û derbasî ola isalmê bibin. Jinên Êzdî yên Herêma Cizîrê ev kiryarên dijmirovî yên ku çeteyên dewleta Tirk li dijî civaka Êzidî şermezar kirin û bang rêxistinên mafê mirovan yên navneteweyî kirin ku li hemberî qirkirina gelê kurd û bi taybet civaka Êzdî bêdeng nemînin.

Jina Êzîdî bi navê Leyla Ibrahîm ya ji bajarê Amûdê kiryarên dijmirovî yên çeteyên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî civaka Êzîdî şermezar kirin û wiha got: “Em vê kiryara li dijî ola Êzdî li ser kurdên me yê Êzdî yê ku li Herêma Efrîn mane şermazardikin , em pir xemgînin ji ber ku kurdên Êzdî tim û dayim rastî kiryarên dijmirovî tên û ev ne cara yekê ye li serê me ev tişt diqewime , ji ber ku kurdên Êzdî bi ola xwe ve girêdayî ne û tevî zor û zehmetiyan jî man li ser ola xwe û çanda xwe ya herî kevnare diparêzin, herdem dibin armanca dijmin. “

Leyla Ibrahîm dazanîn ku ew malbata Êzîdî ku ola xwe guhertin ola Islamê, rastî gefên çeteyên dewleta Tirk hatine û wiha domand: “Em dizanin ku malbata kurdên me yê Efrîn rastî gelek zextan hatine da ku ola xwe guherîne, li gorî agahiyên di destme de gefên `îşkence , kuştin , revandin û gelek kiriyarên ku li ser malbatê hatine kirin, heta ku ola berdane. Ji her kesî re eşkere ye ku heta roja îro jî hin ji malbata kurdên Êzdî di girtîgehên çeteyên ser bi dewleta Tirk ya dagirker ve dene , di heman demê de jî em dizandin ku guhertinA ol ne bi gotina dev tê guhertin, lê bi dil û baweriya mirove.”

Leyla bang li dewletên Navneteweyî herwiha Saziyên Mafê Mirovan kir ku Çanda Êzdiyan ji qirkirinê biparêzin û li wan xwedî dekevin û wiha axaftina xwe qedand : “Em bang li rêxistinên mafên mirovan yên navnetweyî dikin ku çanda kurdên Êzdî ji qirkirinê biparêzin û li wan xwedî dekevin , bi taybet jî yên ku dev ji axa xwe li Efrîn bernedane , ji ber ku ew bi rojane rastî êrîşên qirkirinê tên, daxwaza me ew e ku çanda Êzdiyan , çanda kurda ya herî kevnare bê parastin û hêviya me pir mezine di vî warî de. Bêdengî tê wateya hevkariyê”

# Şervanên jin ên Ereb: Em xwedî li ax û azadiya xwe derdikevin

**Jinên Ereb ên ku ji bo parastina jin û xaka xwe di nava artêşê de cih girtin, diyar kirin ku têkoşîna YPJ’ê di avakirina nasnameya wan a şervan de bi bandor bû.**

Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) bi pêşengiya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bi pêngava ku di 1’ê Hezîrana 2016’an de dabû destpêkirin, di 15’ê Tebaxa 2016’an de bajarê Minbicê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi temamî ji çeteyên DAIŞ’ê rizgar kir.

Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) ya mîna Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di bin sîwana QSD’ê de jî cih digre gav bi gav di rizgarkirina Minbicê ji çeteyên DAIŞ’ê de rolek mezin lîstin. Gel û jinên Minbicê yên ku di jiyana xwe de cara yekem şervanên jin dîtin, ji şervanên YPJ’ê gelekî bandor bûn.

Tevlîbûn û helwesta YPJ’ê ya di her qonaxa pêngava li dijî DAIŞ’ê de rê li pêşiya jinên Minbicê vekir ku rêxistinên xwe yên parastinê bi pêş bixin. Piştî rizgarkirina bajêr gelek jinên Ereb beşdarî leşkerî bûn û xweparastina jinan pêş xistin.

Li Minbicê ya ku di serdema DAIŞ’ê de tarîtîyeke dijwar derbas bû, îro jin ji leşkerî heta siyasî, aborî, jiyana civakî û rêveberiyên herêmî di her qadê de pêşengiyê dikin. Jinên Ereb ên têkoşer anîn ziman ku ew di bin bandora YPJ’ê û têkoşîna jinên Kurd de hatin qada leşkerî.

**‘Min digot tenê jinên Kurd şer dikin’**

Ola Yehya ku di sala 2022’an de di nava Meclîsa Leşkerî ya Minbicê de cih girt, diyar kir ku ji bo parastina xaka xwe û jinên xwe di qada leşkerî de cih girtiye û got, “Dema ku bajarê Minbicê hate rizgarkirin, jinên bi porê hûnandî çek li ser milên wan digeriyan gelek bandor li min kir. Min meraq kir ku jin çawa çek hilgirtin û çawa şer kirin. Dema min şervanên YPJ’ê dît, min digot qey jinên Kurd çek hilgirtine. Min nizanîbû ku jinên Ereb jî di vî warî de cih girtine û li eniyan dest bi şer û têkoşînê kirine. Ev hemû tiştên ku ez dîtim, ji bo ku ez tevlî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bibim û parastina jinan bikim, ji min re teşwîqeke xurt çêkir.”



**Bi têkoşînê zextên civakî ji holê rakir**

Ola Yahya diyar kir ku tevlîbûna xwe ya Meclîsa Leşkerî ya Minbicê di jiyana wî de xaleke werçerxê ye û got, “Ji ber ku min girîngiya jiyana azad bi fêrbûna felsefeya Rêber Abdullah Ocalan fêm kir. Heta ku em negihin armancên xwe û hemû jinan azad nekin, ez ê ji vê rê venegerim.”

Ola Yahya jî anî ziman ku dema wî biryar da ku bibe şervan, rastî zextên civakî hat, lê belê dev jê berneda û li ber xwe da.

**‘Jinên Ereb ji têkoşîna YPJ’ê bandor bûn’**

Rêvebera Meclîsa Leşkerî ya Jinê ya Minbicê Fatima Muhammed jî got, “Hemû şervanên jin ên beşdarî Meclîsa Leşkerî ya Minbicê bûne, ji têkoşîna YPJ’ê gelekî bandor bûne û ev yek bûye sedema veguhertineke radîkal. Di nava me de şervanên ji hemû pêkhateyên Ereb, Kurd, Çerkez û Tirkmen hene. Ti pêkhate nehatin biçûkxistin û dûrxistin.” **JÎNHA**



# Bihara helbest û nivîsa kurdî ‘Konê Reş’

Nivîskar û helbestvanê Kurd Konê Reş bi nivîs û helbestên xwe yên kurdî yên curbecur bû bihara nivîs û helbesta kurdî, tevî hemû zehmetiyan jî, wî ji peyv û hovokên şêrîn hestên xwe bi civakê re parve dike û bû pêşengê nivîskar û helbestvanên Kurd.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Konê Reş di sala 1953an de li gundê doda yê girêdayî bajarê Qamişlo hatiye ser rûyê dinyê. Navê wî yê rast Selman Osman Abdo ye. Ji malbateke Kurdperwer, zimanhez û rewşenbîr e. Xwendina xwe ya seretayî û anavîn li Qamişlo xwendiye û ya amadehî jî li bajarê Hesekê qedandiye. Piştî wê hewl daye ku xwendina xwe li Almanya bi dawî bîne, lê ji ber reşa madî, nikarîbû xwendina xwe li Almaniyayê bi dawî bike û careke din vedigere bajarê Qamişlo.

Konê Reş ji mêj ve bi dûv ziman, folklor û toreya gelê xwe de ye. Di gelek kovar, rojaname û belavokên Kurdistanî de beşdariya wî heye. Ew ji nivîskarên pêşeng yên bajarê Qamişlo ye. Piştî Osman Sebrî, Cegerxwîn, Qedrî Can, Tîrêj, Keleş û Rezoyê Osê , Konê Reş e. Ew xwediyê kovara “Gurzek Gul” bû, ew ku bi dizî di navbera salên 1989 û 1992an de, li Qamişlo dihat belav kirin.

Di sala 2003an de Konê Reş beşdarî di sedsaliya Cegerxwîn de kiriye li Amedê. Di sala 2006’an de jî, bûye yek ji helbestvanên cîhanî (Poetas del Mundo) û jêre rûpelek hatiye vekirin di nav her 8 helbetvanên Kurdistanê de.




**Hezkirina Konê Reş bi zimanê kurdî**

Nivîskar û helbestvanê Kurd Konê Reş derbarê xebat û jiyanan xwe de ji me re axivî û wiha got: “Ji zaroktiya min ve, hezkirin û girêdana min ya bi zimanê dayikê re pir xurt bû. Min bi Erebî dinivîsand, lê piştî ku min Cegerxwîn nas kir, ku hezkirineke mezin ji zimanê min ê dayikê re çê bû, û min biryar da ku bi zimanê kurdî binivîsim. Ceger Xwîn û stranên Şivan Perwer roleke mezin di hezkirina min ya ji zimanê Kurdî re lîst.”

**Hin berhemên Konê Reş yên çapbûyî**

Dîroka Rojanamegeriya Kurdî li Sûriyê û Libnanê: 1932 – 2012, lêkolînek berfireh e, Duhok 2013.
Bajarê Cizîra Botan û Hunera Mîr Bedirxan, Stanbol, 2013.
Ji Stêrên Welatê Qedexe, lêkolînek berfireh e li dor 30 navdarên Kurd, Duhok, 2013.
Di warê helbestên mezinan de: – Welato!, Helbest, Beyrût, 1998.- Dergehê Jîn û Evînê, Helbest, Beyrûrt, 2001.- Cûdî Çiyayê Miradan, Helbest, wergerandina Hejar Îbrahîm, Şam, 2004.- Dara Çinarê, Helbest, wergerandina Îmad Elhesen, Şam 2006.
Şîhîna Şevbuhêrkên Dîl: Helbest, Ji weşanên Yekîtiya Nivîskarên Kurd tayê Duhokê, êlûna 2010.
Di warê helbestên Zarokan de:– Sîpan û Jîn, Beyrût, 1993. – Şagirtê Bedir-Xan im, helbestên zarokan: Beyrût, 1996.
Helbestên zarokan: Amed 2013.

Konê Reş derbarê pirtûkên wê yên ku herî zêde ji wan hez dike wiha got: “Ji pirtokên min yên ku ez herî zêde jê hez dikim, Dîroka Qamişlo ye, ew ji 376 rûpelî pêk tê û ez pê serbilind im.”

**Çima navê Konê Reş bi kar anî**

Ewrê Reş Konê Reş, ev nav bal kişandiye, adeta helbestvan û nivîskaran e, ku sernavan li xwe bikin, lê navê Konê Reş di nav navên xerîb de, Konê Reş wiha dibêje : “Li gundê ku ez lê dijiyam, cîranekî me yê kal hebû û navê wî Ehmed bû, ew di nav xelkê de bi kesayetiyeke xurt, bi comerdî, ji neteweya xwe hezker dihat nasîn û tenê bi kurdî diaxivî, bapîrê min jê re digot Konê Reş, herwiha min dişbhandinê, ji min re got ku tu mîna Konê Reş î û navê min wiha ma.

**Nifşê pêşeroj bi rê ve dibe**

Konê Reş wiha dest nîşan kir ku gelek nivîskarên Kurd çêbûn, ku ji bo belavkirina çanda kurdî, û temamkirina meşa nivîskar Ceger Xwîn, Osman Sebrî û nivîskarên din, ciwanên ku riya wan dişopînin ketine bin bandora van nivîskaran.



Konê Reş wiha got: “Zimanê kurdî di rojên me de qedexe bû, lê me bendê tirsê şikand û nasnameya wê li ser rûpelên dîrokê nivîsand, ji bo ku bi nifşan binivîsin, bixwînin û çap bikin. Tevî ku dem derbas bûye, ew hesta ku ez di dema nivîsandinê de hîs dikim, neguheriye lê ji nû ve tê çêkirin.”

Konê Reş axaftina xwe wiha qedand: “Ji sala 2012’an ve, di dîroka Kurdistanê de yekem car dibistanên Kurdî dest pê kirine, lewra bername bi zimanê Kurdî ye, di demekê de ku dîtina pirtûkeke bi zimanê Kurdî ji bo me xewnek bû, herwiha îro zarok û nifş bi zimanê xwe yê resen fêr dibin, ku yek ji van nifşên pîroze Bitûl Resûl e, ku bi temenekî biçûk karîbû pirtûkên bi zimanê kurdî binvîse. Ez bi helbestvanên kurd yên nifşên nû pir ser bilind im.”

# ‘Ez hestên xwe bi wênesaziyê vedibêjim’

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Wênesaza ciwan Şîfa Yusif diyar kir ku ew bi riya xêzkirina wêneyan, hestên xwe vedibêje û got, min cîhana xwe ya hunerê bi firçe û pênûsên xwe afirand û bi rengên bedew xêz kir.**

Di jiyana her mirovekî de hunera xeyal û xewnên zarokatiyê heye. Li gorî wê xeyalê dibe xwedî pîşe û kar. Lewra bi xwesteka dilê mirovan û israra karê xwe hêdî hêdî dibe xwedî berhem û huner. Lewra yek ji berhemên ku di nav civakê û cîhanê de belavbûyî ne hunera wênesaziyê ye. Hûnera Wênesazî, dîrokekê pir dirêj heye. Em dikarin bêjin mirovahiyê bi xîzkirina jiyana xwe, derdorê xwe, bûyer û çanda xwe hem danasina serdema xwe kiriye, hem jî hunera wênesaziyê afirandin ye. Her wiha hest û ramanên xwe derxîstine hole. Li ser bingeha wê mirovan kariye di roja me ya îro de jî bi tabloyên xwe hêstên ku jiyan dike bi civakê re parve bike û peyamên xwe bi vê rêyê digihînin civakê.



Hêjayî bibîrxistinê ye ku di lêvegera lêkolînên dîrokî de tê payîn ku, hunera wênesaziyê dîroka wê vedigere 20 hezar sal a beriya zayinê.

Yek ji wênesazên ciwan ku em rastê wê hatin Şefa Yûsiv e ku bi hest û ramanên xwe tabloyan xêz dike û bi xêzkirinê jî, hestên xwe vedibêje.

Wênesaza ciwan ya bi navê Şefa Yûsiv ya 16 salî, bi xwestek û hezkirinek pir mezin dest bi xêzkirin wêneyan kir. Ew ji zaroktiya xwe ve, ji wênesaziyê hez dikir. Şefa di temenê 10 salî de dest bi wênesaziyê kir, herwiha di xwendina xwe ye dibistanê de jî serkeftî bû û ji bo bibe wênesazeke serkeftî jî bi israr bû.

’Destpêkê min rûyên mirovan xêz dikir’

Şîfa Yusif bi hezkirinekî mezin behsa çîroka xwe ya wênesaziyê kir û wiha got: “Min di sala 2017`an de dest bi xêzkirina wêneyan kir. Hezkirina min ji wênesaziyê re pir hebû. Di destpêkê de min wêneyên xwe bi pênûsa risas xêz dikir, bi taybet min ruyê mirovan û wêneyên bi wate xêz dikir, roj bi roj min dît ku pêşketin bi min re çêdibe û gav bi gav min dest bi karanîn rengê avî û rengê zeytî di xêzkirina wêneyên xwe de kir. “

’Hezkirina min ji wênesaziyê re roj bi roj mezintir bû’

Şîfa Yusif di berdewamiya axaftina xwe de behsa hezkirina xwe ya ji bo hunera wênesaziyê kir û wiha got: “Her ku ez mezin dibim, erkên li ser milê min zêdetir dibin, herwiha hêzkirina min ya ji xêzkirina wêneyan jî, zêdetir dibe. Ji destpêkê de min ne dixwes ku demê xwe vala derbas bikim, ji ber vê yekê min min di dema valahiyê de, pênûs û rengên bikar dianîn, min hewil dida ku ez fêrî xêzkirina wêneyan bibim. Ji ber ku ez bi israrbûm, ez fêr bûm. Di pêşerojê de, ez ê amedekaiya xêzkirina tabloyên mezin yên bi rengên zetê bikim.



’Divê herv ciwanek jêhatiyên xwe pêş bixe’

Şefa diyar kir ku ji destpêka fêrbûna wênesaziyê de, dayîk û bavê wê pişgiriya wê kirin e û wiha axaftina qedand: “Ji destpêkê de dayîk û bavê min piştgiriya min kirin û hêz dane min. Di dema niha ji ber xwendê derfet nebû ku ez beşdarî pêşengehan bibim. Ez bi israrim ku di wênesaziyê de serkeftinên mezin bi dest bixim. Herwiha ji her ciwanekî tê xwestin ku jêhatiyên xwe pêş bixe û cîhana xwe ya hunerê ya taybet avav bike.”

# Projeya Zanîngeha Rojava ya nû

Hemze Sêvo/Qamişlo

**Rêveberê Ofîsa Endeziyarî ya Pirojeya zanîngeha Rojava ya nû Hesen Mihemed diyar kir ev piroje ji bo pêşxistna perwerdeyê gaveke pir girînge û got, tevahiya xwendekarên bakur û rojhilatê Sûriyê dikarin cihê xwe di zanîngehê de bigrin û bi zimanê xwe bixwînin.**






Pirojeya ku ji aliyê Zanîngeha Rojava ve di 4'ê Nîsanê dest pê kir; mezintirîn zanîngeh e ku wê li ser asta bakur û rojhilatê Sûriyê,li bajarê Qamişlo were avakian. Rûbera vê pirojeyê 800 Hektar e, wê rêveberiya zanîngeha Rojava gavbigav li gor mesrefa ku Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê jê re terxandine,hejmarek ji fakulte, xewgeh û stadên werzêşê di vê zanîngeha nû de, ava bike.

Di derbarê vê pirojeyê de, rêveberê Ofîsa Endeziyariya Pirojeya Zanîngeha Rojava ya Nû Hesen Mihemed ji me re axivî.

### Mezintrîn zanîngeha li ser asta bakur û rojhiatê Sûriyê

Rêveberê pirojeyê Hesen Mihemed diyar kir ku sedem ji avakirina vê zanîngehê tunebûna cihê xwendekarên pêşerojê di nav fakulte û peymangehên heyî de ne û wiha got: "Ji ber ku derfeta fakulte û peymangehên heyî nema hejmarên bêtir ji xwendekaran vehewîne nav xwe ,ji ber hejmara xwendekaran pir bûye û nema têra xwendekarên ku niha dibistanan dixwînin,dike;me weke Ofîsa endeziyarî ya pirojeyê, ev piroje pêşkêşî Rêveberiya Xweser kir û hate erêkirin. Herwiha weke vejînekê ji zanstê û pêşxistina di warê zimanê kurdî de, me zanîngeha nû di 4'ê Nîsanê, Roja Rojbûna Rêber Apo de dest pê kir. Ev zanîngeha ku were avakirin, wê mezintirîn zanîngeh li ser asta zanîngehên bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Herwiha derfet heye ku bi hezarên xwendekaran di nav xwe de bihewîne."

### 'Xwendekarên ji hemû pêkhateyan dikarin di zanîngeha nû de bixwînin'

Mihemed di berdewamiya axaftina de, da zanîn ku ciwanên bakur û rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên wê ve dikarin cih di zanîngehê de birgrin û wiha got: "Hemû beşên ku di dema niha de, di fakulte û peymangehên me de henin, wê di zanîngeha nû de jî vebin, ne tenê ev yek,lê wê di vê zanîngehê de,gelek beşên nû jî vebin. Di warê zimanê perwerdeyî yê zanîngehê de jî dê zimanê erebî,siryanî jî di beşên wan yên taybet de hebe, lê zimanê kurdî û inglîzî wê bi awayekî fermî di hemû beşên de hebin. Herwiha wê pirbûna zimanan di zanîngeha me de, derfetê dide hemû pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê ku cihê xwe di vê zanîngehê de bigrin, lewra em ji wan ciwanên ku ber bi zanîngehên Rêjîma Sûriyê ve diçin bang dikin ku deriyê xwendinê li vê zanîngehê ji wan re vekiriye."

### 'Bi dawîkirina vê pirojeyê li ser derfetên madî dimîne'

Rêveberê Ofîsa Endeziyariya Pirojeya Zanîngeha Nû Hesen Mihemed di dawiya axaftina xwe de, astengî û derengmayîna amadekirina pirojeyê da diyarkirin û wiha axivî: "Pirojeya me gelekî mezin e, lewera pêdiviya wê bi mesrefeke mezin jî heye, em li gor tiştê ku Rêveberiya Xwesr ji me re terxandine, kar dikin. Em gelekî astengiyan di warê cihê wanedayîn û raketina xwendekaran dikşînin û em niha neçar in ku hêdî hêdî di vê pirojeyê de bixebitin. Herwiha me niha li gor derfetên xwe tenê dest bi avakirina du xewgeh û fakulteyekê kiriye. Hêjayî gotinê ye ku karê ku em dikin tev ji bo pêşxistna asta zanstî ya civaka me ye, rêxistinên mirovahî yê Cîhanî ji bo karên wisa bi pirojeyên hemû welatan re dibin alîkar,lê van rêxistinan bi me re têkildar nebûne û tu alîkarî pêşkêş nekirine, ev yek dihêle ku bi dawîbûna vê pirojeyê dereng bimîne. Banga me ji rêxstinên cîhanî re heye ku ew jî tevlî alîkariyên ku Rêveberiya Xwesr ji me re pêşkêş kirine, bibe."

# Koçberên Efrînê: Ji ber buhayê zêde em nikarin rojî bigrin

**Jinên Efrînê yên koçberî kantona Şehbayê bûne zehmetiyên xwe yên di meha remazanê de anîn ziman û gotin ku di vê mehê de divê buhayê pêdiviyên sereke kêm bûya lê ji ber zêdebûnê nikarin kîloyek goşt bikirin.**

Di meha remezanê de li kantona Şehbayê ji ber rêgiriya Hikumeta Şamê zêde bûye rêjeya buhabûna kelûpelan jî zêde bû. Ev jî bandorê li ser jiyana gel dike û zehmetiyên jiyanî bi xwe re tîne. Di vê mehê de mirov xwarinên xweş û giran amade dikin û rojiya xwe digirin lê mixabin koçberên Efrînê li Şehbayê ji ber buhabûna tiştan astengiyan di meha remezanê de dibînin û nikarin rojiya xwe bi rehetî bigrin. Jinên Efrînê yên koçber nêrînên xwe der barê buhabûnê de anîn ziman.

### 'Me di vê mehê de xwarinên giran amade dikirin'

Fikret Ezîz Hesen der barê buhabûnê de wiha dibêje: "Em koçberên Efrînê ne, tiştekî me tune ye em pê debara xwe bikin. Îsal her tişt buhatir bûye, gel jî zehmetî û astengiyan dibîne bi taybetî di meha rojiyê de. Divê mirov di vê







mehê de xwarinên giran û xweş ji malbata xwe re amade bike lê mixabin ji ber buhabûnê em nikarin xwerinê amade bikin. Divê çareseriyek ji pirsgirêka buhabûnê re bê dîtin. Dema em li Efrînê bûn me bi rehetî dikaribû jiyana xwe berdewam bikira, her çendî buhabûn hebûya jî lê dîsa ji ber rewşa me baş bû, me bi buhabûnê hîs nedikir. Li Şehbayê derfetên kar kêm in lewre em astengiyan dibînin."

### Di meha remezanê de pêwîst e rêjeya tiştan erzan be'

Fehîma Ehmed jî teqez kir ku di meha remazanê de mirov sibê û êvarê rojiyê digrin ji ber buhabûnê û got: "Em xelkê Efrînê gelek zehmetiyan dikşînin. Ne bes e zehmetiyên dûrbûna ji welat, zehmetiyên buhabûna rêjeya kelûplan da ser. Em rojiyê digrin divê rêjeya tiştan jî erzan be. Me li Efrînê dema xwarinek di meha remezanê de amade dikir malbat tevahî li hev diciviyan, em gelek kêfxweş bûn. Em nikarin ji zarokên xwe re kîloyek goşt di meha rojiyê de bikirin. Ne sebze û ne goşt em dikarin bikirin. Divê herî kêm di meha remezanê de tişt ji gel re erzan bûya ji bo ku bikaribin rojiyê bigrin û xwarinê çêbikin." **JÎNHA**



## WATEYA REMEZANÊ

Hafiz Ahmet Turhalli

Meha Remezanê li gorî bawermendên Ola Îslamê meheke pîroze. Gelo meha remezanê pîroziya xwe ji ku de rê û ji çi digre?

Di Remezanê de Qur'ana pîroz daketiye. Di vê mehê de wehya despêkê bi gotina,Iqre' Bixwîne daketiye. Di civakê de guhertin armanca Qur'anê ya serekeye. Civaka berê Qur'anê civakekî, ji dadmendiyê dur, bê rawişt û zalim bû. Bi hatina Qur'anê û Rehberiya Hz Muhemmed s.X.l karûbarekî civakî hate destpêkirin. Ji bo civak ji nexweşiyên Ola sexte, oldarên sexte dûr keve, qur'anê got Ol tenê ji bo Xwedaye. Pêxemberê me di meha remezanê de dest bi tekoşînê kir. Berê ji bo zîhniyet û fikir werin paqijkirin, karê bîrdozî û baweriyê hate meşandin. Dijî cehaletê, zanebûn, dijî bê wijdaniyê wijdan, dijî bêrawiştiyê rawişt û hebandina yek Xwedayî bû armnanca sereke.

Di meha remezanê de çiriska vegera mirovahî, ji bo vegera xwezaya xwe a rasteqînî dest pê kir. Lewre mirovahî ji rastiya xwe hatibû durxistin. Binavê Xwedê û Ol gellekî tiştên dij mirovî, li bajarê Mekê dihatin kirin. Divê mehêde Qur'an û Pêxember ji me daxwaz dikin dakû em nefsa xwe bikşînin hesabê û jiyana xweya salane di berçavde derbaskin. Li gor pîvanên Qur'anê xwe nûde înşa bikin, baweriya xwe kûrtir û xurtir bikin, wateya vê mehê bizanibin û pîvanên Qur'anê di jiyana xwe de cih bi cih bikin.

Heyva remezanê heyva kurkirina fikr û ramanê paqije. Heyva remezanê ji bo tekamûlkirina rûhê însan derfeteke. Heyva Remezanê, terikandina tiştên nebaşe, dawî anîna xwe xapandiniye, dij derketina neheqiyê ye, şikandina pûtên wek pere, desthelat û tirsiye. Avdankirina şexsiyetek bi rûmet e.

Remzan tekoşîna dijî ramanên şîrkiye, mucadeleya dijî Olfiroşan û oldarên sextekare. Tekoşîna dijî kesên xwe mezin dibînin û mirovan biçûk dibînin.

Xwedê ji bo Remezanê weha dibêje:, Heyva remezanê de ji bo Mirov riya rast bibîne, rastî û nerastî ji hev veqetîne û ji hev cuda bike Qur'an me qur'an daxist, kê bighîje vê mehê, bila bi rojiyê vê mehê pêşwazî bike.' (Beqere 185)

Ji bo mirovahî careke din ronahî û tarîtiyê, zilm û edaletê, ji hev veqetîne di vê mehêde Qur'an şand.

Ji bo bawermendên rast û durist hefsarê nefsa xwe bi dest bixin, divê vê mehê bi zikê birçî û tî vê mehê pêşwazî bikin. Pîvanê Rojiyê ne tenê birçîbûn û tîbûne, berovajî xwedî derketina hişmendiya berpirsiyariyê ye.

Peyva teqwayê wateya xwedîderketina berpirsiyariyê ye.

Rojî bi me dide zanîn ku, kesê/kesa berpirsiyariyê rake rastî zehmetiyan tê, dijî van zehmetiyan mirovan hînê berxwedanê dike. Kesê nikaribe zikê xwe terbiye bike, dê nikaribe başiyê bike. Kesê nikaribe xwe rast bike, nikare derûdora xwe jî rast bike. Bi pêkanîna rojiya rast, kesayet karê xwe paqij bike û menewiyata xwe bilind bike. Mixabin bi Îslama desthelat, Îslama rast hatiye berovajî kirin. Ji ber wê sedemê, armanca înşakirina şexsiyeta kamil hatiye ji bîr kirin.

Di remezananêde muhtac û xizan hatine ji bîr kirin. Îsraf û quretî, xwe nîşan dan bûye kesayet. Hevaltiya zaliman, qatilan û di sofra wande xwarina fitarê bûye Ol.

Kesê ticareta dîn dikin bûne Oldar. Kesê Oldar mane sêwî, kesê olfiroş bûne desthelat û binavê Xwedê xapandinan dikin.

Divê meha remezanê vegere eslê xwe pîvanên dadê, hevkariya feqîran û paqijkirina nefsê bibe armanc.

Dema Mirov xwe paqij bidêre, dê mirovahî rehet bike.



# Tifaqa Ked û Azadiyê: Em ê bi ser bikevin

Navenda nûçeyan

**Tifaqa Ked û Azadiyê derbarê hilbjiartinan de civîneke çapemeniyê li dar xist û diyar kir ku ewê di vê hilbijartinê de bi ser bikevin.**




Tifaqa Ked û Azadiyê, bi civîneke çapemeniyê helwesta xwe ya têkildarî hilbijartinina eşkere kir. Civîna çapemeniyê li avahiya Yekitiya Mulkiyeyiyan a li Enqereyê hat li darxistin û Hevberdevkê Giştî yê Partiya Çep a Kesk Îbrahîm Akin, Hevserokê Giştî yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Mîthat Sancar, Serokê Giştî yê Partiya Karkerên Tirkiyeyê (TÎP) Erkan Baş, Serokê Giştî yê Partiya Tevgera Karkeran (EHP) Hakan Ozturk, ji Federasyona Meclîsên Sosyalîst (SMF) Erdal Ataş, endama Lijneya Berdevkên Partiya Azadiya Civakî (TOP) Perîhan Koca û Serokê Giştî yê Partiya Kedê (EMEP) Ercument Akdenîz ên di Tifaqa Ked û Azadiyê de cih digirin beşdarî civînê bûn.

Di civînê de Î hevberdevkê Giştî yê Partiya Çep a Kesk brahîm Akin axivî û wiha got: "Tifaqa ME ya ku avakirina pêşeroja demokratîk a Tirkiyeyê dike armanc wê ji hilbijartinan piştgiriyeke mezin a gel bigire û ji aliyê kedê, aştiyê, demokrasiyê ve nûnertiya Meclisê ya bi hêz bi dest bixe."

Akin,diyar kir ku EHP, EMEP, HDP, SMF û TOP a di nava tifaqê de cih digirin wê li 81 bajaran ji lîsteyên Partiya Çep a Kesk bi awayekî hevkar bikevin hilbijartinê, TÎP jî wê li 49 bajar û 52 herêmên hilbijartinê bi logoya xwe bikevê û li hemû bajarên din wê piştgiriya Partiya Çep a Kesk bike.

Akin di dwamiya axaftina xwe de wiha got: "Hemû herêmên hilbijartinê yek bi yek hatine lêkolînkirin, parlamenterên ku HDP'ê di demên borî de qezenckirine berçav hatine wergirtin, hem ji aliyê deng hem jî ji aliyê parlamenteran ve qezenckirin hatiye armanckirin. Di encama van nirxandinan de em dixwazin ji we re ragihînin ku rêbazek li ser li hev hatiye kirin ku armanca zêdekirina hejmara parlamenteran bibe rastiyek."

hevberdevkê Giştî yê Partiya Çep a Kesk brahîm Akin di dawiyê de wiha got: "Em di wê baweriyê de ne ku ev biryara me wê xizmetê ji gelên bindest, kedkar, karker, jin, ciwan û hemû beşên gelan re bike, bi hemû pêkhateyên wê re wê Tifaqa Ked û Azadiyê di hilbijartinan de ser bikeve. Bila ji hemû karker, kedkar, jin, ciwan û gelên me re li ser xêre be. Em ê bi hev re qezenc bikiln. Gel wê qezenc bikin."

# Êrîşên artêşa Tirk a dagirker bênavber dewam dikin

Navenda nûçeyan

**Êrîşên artêşa Tirk a dagirker yên li dijî Qadên Berxwedanê yên Gerîlayên Azadiyê bê navber dewam dikin. Dagirkerî rojane bi tang, top, hawan û tevahiya çekên giran û qedexekirî êrîş dike.**



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ragehand ku di 7'ê Nîsanê de dagirkeran êrîşî çeperên berxwedanê yên Sîdayê kirin, hêzên me ji bo parastina xwe bersiv dan û pevçûn çêbû. Herwiha di 7'ê Nîsanê de herêma Girê Bahar carekê bi balafirên şer hate bombekirin.

HPG'ê da xuyakirin ku di 7'ê Nîsanê de Qada Berxwedanê ya Girê Cûdî û çeperên berxwedanê yên Çemço û Sîdayê 26 caran bi helîkopterên êrîşê, obus, tank û çekên giran hatin bombekirin.

Artêşa Tirk a dagirker 41 caran Herêmên Parastinê yên Medyayê bombebaran kirin.

HPG'ê da zanîn ku di 6'ê Nîsanê de derdora gundê Bêbadê yê Garê, berpalên Xêrê û çeperên berxwedanê yên li Sîdayê bi balefirên şer 8 caran hatine bombekirin. Di 5 û 6'ê Nîsanê de Qadên Berxwedanê yên Girê Cûdî, Girê Fm, çeperên berxwedanê yên Çemço û Sîdayê bi helîkopterên êrişê, obus, tank û çekên giran 33 caran hate bombekirin.

Artêşa dagirker 83 caran êriş kir HPG'ê diyar kir ku di 4'ê Nîsanê de Qadên Berxwedanê yên Girê Bahar, Girê FM û Girê Cûdî, Çemê Lolanê ya Xakurkê, Qada Girê Şehîd Heqî, çepereyên me yên berxwedanê yên li Çemço û Sîdayê, bi hawan, obus, tank û çekên giran 83 caran hatine bombekirin.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku tevî biryara KCK`ê ya bêçalakiyê, artêşa Tirk a dagirker êrişên bejahî û hewayî li dijî qadên berxwedanê yên gerîla dewam dike û roj bi roj zêdetir dike.

# 203'ê roj bi ser Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' re derbas bûn

Navenda nûçeyan

**Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê 203'ê roj li pey xwe hiştin. Li gorî rêxistinên mafên mirovan heya niha 537 kes ji aliye hêzên rêjîma Îranê ve hatine qetilkirin. Tevî kuştin û işkencekirinê jî, serhildan bi çalakiyan cûda dewam dikin.**



Serhildana 'Jin, Jiyan, Azadî' ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê ku di 16'ê Îlona 2022'yan de dema ku leça kurd Jîna Emînî li Tehranê ji aliyê polîsên exlaqî ve hat qetilkirin, dest pê kir, 203 roj lipey xwe hişt. Serhildanên ku li Seqizê dest pê kirin di demeke kurt li tevahiya Rojhilatê Kurdistan û Îranê belav bû.

Rêjîma Îranê li hemberî serhildana gel xwe negirt û dest bi kuştin, revandin û işkencekirinê kir.

Li gorî daneyên Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê (ÎHR) di nava 203 rojan de herî kêm 537 kes ji aliyê hêzên dewletê ve hatine qetilkirin. Herwiha 4 xwepêşander jî hatin darvekirin. Di heman heyamê de 180 jê bi sûcê tiryakê 309 kes hatin darvekirin. ÎHR'ê bertek nîşan da ku 'Komara Îranê cezayê îdamê wekî alaveke tirsandinê bi kar tîne'da zanîn ku civaka navneteweyî bertekê nîşanî van darvekirinan nade. Di meha Îlonê de 223 kes hatibûn qetilkirin. Di Cotmehê de 100, di Mijdarê de 173 kes hatin qetilkirin. Di meha Kanûnê de hat diyarkirin ku 25 kes hatine qetilkirin.Di navbera 17-30'ê Îlonê de 5 kes, di Cotmehê de 30, di Mijdarê de 57 û di Kanûnê de 72 kes hat qetilkirin. Li aliyekê din jî heta niha bi hezaran kes bi tihmeta beşdarbûna xwepêşandana di girtîgehên rêjîma Îranê de ne û rojane tên işkencekirin.

# ‘EM Ê BI HEMÛ RÊBAZÊN NÎŞTIMANÎ Û DEMORKATÎK TÊ BIKOŞIN’

Navenda nûçeyan

**Êrîşa dewleta Tirk a dagirker bê navber li ser qadên berxwedanê, başurê kurdistanê, wargeha Ş. Rustem, şengalê û rojavayê kurdistanê bê navber didomin. Herweha li Bakurê Kurdistanê jî binçavkirin, girtin û pişaftin bê navber tê meşandin. Êrîşa herî dawî ku li ser balefirgeha bajarê Silêmaniyê jî hatî kirin jî mirov dikare mîna dewama van êrîşên ku bê navber li ser gelê kurd û îradeya wî ya azad bigre dest. Di serî de jî mîna ku em dizanin navenda van êrîşan girtîgeha îmraliyê ye û tecrîda giran a ku li ser rêber apo tê meşandin e.**

Ji ber ku dewleta tirk a dagirker û qirker hebûna xwe li ser qirkirina gelê kurd dide maşandin û ji bona pêkanîna vê yekê tu sînoran ji bona xwe nasnake.

### ‘ÊRÎŞA Lİ SER PALEFİRGEHA SİLÊMANİYÊ PLANEKE ÎSTÎXBARATÎ Û SÎXURÎ YA BİYANÎ Û NAVXWEYÎ YE’

YNK` ê êrişa li ser balafirgeha Silêmaniyê şermezar kir û got “Ev êriş planeke îstixbaratî û sîxurî ya biyanî û navxweyî ye ku ji berê ve hatiye plankirin û wek ketina



artêşa dagirker a li nava xaka Herêma Kurdistanê ye.”
Mekteba Siyasî ya Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistanê (YNK) der barê êrişa li ser Balafirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê de daxuyanî da.
“Êrîşa li ser balafirgeha navneteweyî ya Silêmaniyê planeke pêşwext e ji bo îstixbarat û sîxuriya derve û navxweyî ku wek anîna artêşa dagirker bo Herêma Kurdistanê ye. Ji ber vê yekê em vê êrîşê bi tundî şermezar dikin, em li bendê bûn ku rayedarên peywendîdar li şûna ku vî sûcî rewa bikin, tedbîran bigirin, lêkolîn bikin û şermezar bikin.
Lê wek karên xwe yên berê, ew hindikahiyeke xwebexş di nava PDK’ê de ne ku peywendî jêr bi jêr û taybet hene, dibin şopandker û saziyên hikumetê ji bo karên îstixbaratî yên dewletan bi kar tînin û asayîşa Herêma Kurdistanê û parêzgeha Silêmaniyê têk didin.
Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistanê her tim baweriya xwe bi yekrêziya gelê Kurd û aliyên siyasî hebûye.
Her wek armanc bû li ser asta beşên din ên Kurdistanê, hevkarî û hemahengî û peywendiyên dostane hebin, li ser bingeha parastina berjewendiyên neteweyî, hevkarî û hemahengî her wek destdirêjî û êrişkirina li ser her navçe û parêzgeheke herêmê bi sûc tê zanîn û tê şermezarkirin.
Ji ber ku di çarçoveya nêrîna xwe ya nîştimanî de, tevahiya Herêma Kurdistanê pîroz dibîne û ji bo vê yekê jî bê westan têkoşîn kiriye û xwîn rijandiye. Şerm e bo dijminên Kurdan û hevalên wan.”

### ‘XİRABKİRİNA ARAMİYA HERÊM Û SİLÊMANİYÊ XETA SOR E’

Serokê YNK’ê Bafil Talebanî der barê êrişa ser Balefirgeha Silêmaniyê de daxuyaniyek belav kir û wiha got: “Em êrîşa li ser Balafirgeha Navdewletî ya Silêmaniyê û hewldana sterîl ên xizmetkarên biyaniyan ku armanc têkbirina ewlehiya sînorê Silêmaniyê ye, bi tundî şermezar dikin.”
Serokê Yekitiya Nîştîmaniya Kurdistanê(YNK) Bafil Talebanî der barê êrişa ser Balefirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê de bi daxuyaniyekê ragihand ku kiryarên tawanan û derbaskirina sînorên Herêma Kurdistanê û Iraqê bi çavsaxî û serpereştiya alî û saziyên emnî ên îstîxbarata navxweyî tên kirin û wiha got: “Ne tiştekî ecêb e û dîrokeke me ya dirêj li gel heye. Lê Silêmanî û dîroka wê, Silêmanî û xelkê wê ji xeyalên vala yên partiyek mezintir û qehremantir in ku navûdengê wê xirab bikin û jiyana xelkê wê xirab bikin. Berê YNK’ê ji bo parastina yekrêzî û bidestxistina berjewendîyên bilind ên gelê me bêhna xwe didan, lê berdewam reftarên ne guncaw ên hin dezgehên ewlekarî yên partiyeke siyasî di bin siya hikûmeteke deshilatdar û serdest de, hemû sînor derbas kiriye û rewş ber bi rawestanê ve biriye.”
Serokê YNK’ê her wiha diyar kir ku ew bi Kurdbûna xwe serbilind û wiha domand: “Kurdistan di dilê me de ye û em ji bo jiyana gelê xwe rû bi rû hemû metirsiyan bûne û dibin. Xirabkirina aramiya Herêm û Silêmaniyê xeta sor e.

### ‘ÊRÎŞÊN SER PALAFİRGEHA SİLÊMANİYÊ XETERİYA Lİ SER HEREMÊ TEVAHÎ YE’

Fermandarê giştî yê QSD`ê êrişa li dijî balafirgeha Silêmaniyê şermezar kir û got ew ê hevkariya xwe ya li gel hevkarên xwe yên li Silêmaniyê bidomînin.
Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî têkildarî êrişa hewayî ya li ser balafirgeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê daxuyaniyek li ser hesabê xwe yê Twitterê parve kir.
Mezlûm Ebdî got: “Em êrişa ji aliyê Tirkiyeyê ve ya li dijî balafirgeha Silêmaniyê şermezar dikin. Ev binpêkirin li Iraq û Sûriyeyê dewam dikin û bandorên wê yên xeternak li ser herêmê hene.”
Ebdî anî ziman ku helwesta Yekitiya Nîştimanî ya Kurdistanê ya “piştevaniya bi birayên xwe yên li Sûriyeyê” dewleta Tirk aciz dike û got: “Em têkiliyên xwe yên destpêkê yên bi bira û hevkarên xwe yên li Silêmaniyê re dewam bikin. Em di eniyekê de li dijî van binpêkirinan in.”

### ‘ÊRÎŞA Lİ SER BALAFİRGEHA SİLÊMANİYÊ, ÊRÎŞA Lİ SER ÎRADEYA GELÊ HERÊMÊ YE’

Meclisa Giştî ya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) bi daxuyaniyeke êrişa li ser balafirgeha Silêmaniyê ya Başûrê Kurdistanê bi tundî şermezar kir û destnîşan kir ku êrîşa li ser balafirgeha Silêmaniyê ji êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Şengal û



Başûrê Kurdistanê ji Zaxo, Dihok, Hewlêr, Mexmûrê ne cuda ye.
PYD`ê got: Êrîşa li ser balafirgeha Silêmaniyê mîna êrişekê li dijî îradeya gelê herêmê ye, her wiha wek ragihandina şer li dijî gelê Kurdistanê û doza wê ya adilane û li dijî destkeftiyên Kurdan û tevahî hêzên demokratîk ên herêmê nîşan da.


### `EM Ê BI HEMÛ RÊBAZÊN NÎŞTIMANÎ Û DEMORKATÎK TÊBIKOŞIN`

PYD`ê di berdewama daxuyaniyê de got: “Em çi êrişên li ser destkeftiyên gelê me yên ku bi saya xwîna bi deh hezaran şehîdan hatine bidestixstin red dikin û şermezar dikin. Ji bo têkbirina van êrişan em ê bi hemû rêbazên nîştimanî û demokratîk têbikoşin.”
Her wiha bal kişand ser girîngiya avakirina yekîtiya Kurdan û wiha pê de çû: “Divê helwesta yekbûyî ya Kurdan û hêzên wê yên neteweyî ji wiha zêdekir neyên paşxistin. Desthilata destpot a navendî û hêzên tarî, gefxwarin û êrişan li dijî tevahî Kurdan û tevahî hêzên ku nûnertiya jiyana hevbeş a tevahî gelên herêmê û yekitiya çarenûsî dikin, pêk tînin.”
Meclisa Giştî ya PYD`ê piştgiriya xwe bi helwesta YNK`ê re anî ziman û got: “Di vê pêvajoya hestiyar a dîrokî de tê xwestin ku hêzên neteweyî yên kurdî û demokrat nakokiyên xwe deynin aliyekî û helwesta xwe bikin yek.”

### ‘TU SEDEMEKE QANÛNÎ Jİ ÊRÎŞÊN TİRKİYEYÊ Lİ SER XAKA IRAQÊ TUNE YE’



Serokkomariya Iraqê êrîşa dewleta Tirk a li djî Balafirgeha Silêmaniyê şermezar kir û bang li hikumeta Tirkiyeyê kir ku lêborîneke fermî bixwaze.
Li gorî ajansa nûçeyan a Iraqê WAÎ’yê, di daxuyaniya Serokkomariya Iraqê de hat gotin: “Karên leşkerî yên Tirkiyeyê li Herêma Kurdistanê û herî dawî hedefgirtina Balafirgeha Navneteweyî ya Silêmaniyê, dubare dibin. Em van zêdegaviyên li djiî Iraqê û serweriya Iraqê şermezar dikin. Em destnîşan dikin ku tu sedemeke qanûnî ku bihêle hêzên Tirkiyeyê bi hinceta hebûna hêzên dijberî wî li axa Iraqê tirsandina sivîlên ewle bidomîne, tune ye.”
Di dewama daxuyaniyê de bang li hikumeta Tirk hat kirin ku bi berpirsyariyên xwe rabe, ji ber van kiryaran lêborîneke fermî pêşkêş bike û pirsgirêkên xwe yên hundirîn bi rêya diyaloga bi aliyên têkildar re çareser bike û ev hişyarî hat kirin: “Heke zêdegaviyên wiha dubare bibin, dê helwesteke tund bê girtin da ku di siberojê de dubare nebin.”



## Civîna 4 alî ya li Moskovayê

Ahmet AKTAŞ


Bi navberiya Rûsyayê, cîgirên wezîrên derve yên Tirkiyê, Îranê û Sûriyê di 3’ê Nîsana 2023’an de li Moskovayê civiyan.
Civîna wan a 4 cîgiran 2 rojan dom kir, lê bêencam bi dawî bû.
Xwedêgiravî, di vê civînê de, wê ji bo civîna wezîrên derve yên 4 welatan zemîn bihata xweş kirin.
Lê, li gel ku mijarên giring xistibûn rojeva xwe, ji bo encama civînê, daxwiyaniyek hevbeş jî nedan.
Tenê serokê şanda Sûriyeyê Eymen Sûsan, daxwiyanî da. Got: Divê teqez Turkiye hêzên xwe ji xaka Sûriyeyê bikişîne û pişgriya komên terorîstên dijberî Sûriyê neke û hwd.
Jixwe kes ne biyaniyên van gotinên Sûriyê ne. Ji mêj ve xwestînên xwe pêşkêşî çapemeniyê kiriye. Berê jî gelek caran gotibû, “eger Turkiye, bi tevayî ji xaka me dernekeve, hevdîtina Beşar Esed û R.Erdogan çênabe”!
Lê divê ev yek baş were zanîn, ku di mijara Sûriyê de, biryar û gotina bingehîn a Rûsya ye.
Her wiha di mijara Tirkiyê de jî biryar û gotina bingehin a DYE û NATO ye.
Erê R.Erdogan, pir dixwaze ev pirsgrêk berî hilbijartinên giştî yên Tirkiyeyê pêk were, ji bo destê wî di hilbijartinan de xurtir bibe. Lê na xêr, heke serwerên wî DYEyê destûrê nede, nikare ti gavên stratejîk bavêje.
Li aliyê din, rewşa Rûsya jî li berçave ye û di şerê Ukraynayê de tengav e. Lewma dixwaze nakokiyên navbêna Tirkiyê û DYEyê mezin bike da ku li Ukrayneyê hinek bêhnê bistîne.
Lê belê di vê navberê de hilwestên balkêş ên Fransayê hene. Bi giştî li Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li Başûr û Rojava li pey hinek senaryoyan e.
Di van rojên diplomasiya germ de, bi Rêveberiya Rojava re têkiliyan zêde dike. Dîsa hinek fermandarên YPGê, vexwendin Parîsê û bi cilên leşkeriyên YPGê, fermî pêşewazî jê re kir.
Her wiha Serokê berê F.Hollande jî, dîsa pesindariya Kurdên Rojava kir û pesnê şerê dijî DAIŞê kir.
Berî çend rojan jî, Navenda Dadigeha Tahkîmê Ya Navenetewî ya li Parisê, dijî Dewleta Tirka biryarek giring stand û 1.5 milyar ceza lê birî. Di vê mijarê de Malbata Berzanî jî li gel ‘Malbata’ R.Erdogan xwedî guneh e û di piraniya cezayan de jî hevpar in.
Li vira hilwesta YNK(Bafil Telebanî)ê balkêş e; vê biryara dadigeha Parisê rast dibîne.
Tê zanîn, berî nuha jî Bafil Telebanî, li ser yekîtiya netewî hinek hilwestên erênî nîşan dabû, hinek daxwiyaniyên hêja diyar kiribû û danstandinê kêrhatî pêkanîbû.
Her wiha, li ser Rêveberiya Başûr, him ji aliyê yekîtiya netewî û him bi giştî rexneyên watedar li kiryarên PDKê dike.
Li gel Rûsya û Çinê, DYE û NATO jî, çendîn dixwazin hegemonî/serweriya xwe li Rojhilata Navîn mezintir bikin û ji bo wê di nava çi hewldanên berfireh de ne, li ber çava ye.
Lê Fransa, li gel ku endamê NATOyê jî, weke ku dixwaze bi Elmanya re, di serkêşiya cîhanê de zêdetir bibin xwedî par. Bûçeya xwe ya leşkerî, ji salên berê zêdetir kiri ye.
Nakokiyên navbera hegemonîn cîhanê, ji tevgêrên azadiya gelan re jî, derfetan zêdetir dikin.



# Haşim Hiso: Ji bo azadiya Rêber Apo em ê asta têkoşînê xurtir bikin

Navenda nûçeyan

**Endamê Însiyatîfa Azadiya Fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan Haşim Hiso diyar kir ku çalakiyên Însiyatîfê yên li ser asta navnetewî û baku û rojhilatê Sûriyê wê xurtir bibin û got, armanca me ya sereke têkbirina pergala Îmraliyê ye**



Însiyatîfa Azadiya Fîzîkî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan di sala 2019’an de, li bajarê Qamişlo hat destpêkirin. herwiha beşeke din li Reqayê hey ew jî girêdayî Însiyatîfa bajarê Qamişlo ye. Kar û xebatên insyatîfê bi taybet şopandina rewşa Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan e, hem ya fîzîkî û hem jî helwesta gelê kurd, Rojhilata Navîn û yên cîhanê derbarê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo.
Di derbarê tevaya çalakiyên Însiyatîfa Azadiya Rêber Abdullah Ocalan de, endamê Însiyatîfê Haşim Hiso ji me re axivî.

### ‘Armanca me Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ye’

Haşim Hiso derbarê armanc û çalakiyên Însyatîfa Azadiya Fîzkî ya Rêber Abdullah Ocalan wiha got: “Ji destpêka ku ev Însiyatîf hatiye damezrandin kar û têkoşîna ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo ranewestiyaye. Çalakiyên me di çarçoveya rêxistinkirina meş, lidarxistina civîn û Konfranan de ye. Me li bajarê Hesekê di 10 Sibata 2019’an de civînek ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî li dar xist, tê de



hemû pêkhateyên bajêr bi girseyî beşdar bûn, di heman çarçoveyê de jî, di sala 2022’an me 2 konfrans li bajarê Reqayê li dar xist, herwiha di 27’ê Kanûna 2022’an de me konferansek li Qamişlo jî li dar xist. Herwiha me di 23 çileya 2023’an de, dest bi Kampaniya Îmzayan ji bo azadiya fîzîkî Rêber Apo kir, hemû pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê bi girseyî tê de beşdar bûn û ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo îmze kirin, hejmara îmzeyan gihaşti 2 meliyon û 600 hezar îmzeyî û me ev yek li ser li ser ragehandinê jî belav kir. Em niha dixwazin bi van îmzeyan û li ser nav û helwesta gelê xwe derbasî Ewrpayê bibin û bi riya dadgehên Ewrpayê daxwaza mafê gelê xwe bikin û azadiya Rêber Apo ya fîzîkî misoger bikin.”
Hiso derbarê çalakiyên Însiyatîfê yên li ser asta navneteweyî wiha got: “Yek ji girîngtirîn çalakiyên me yên ser asta navneteweyî, Konfransa azadiya Rêber Apo ya ku li Başûrê Efrîqiyayê di 28’ê sibatê de hat lidarxistin, tê de Partiyên siyasî, parêzerên Rêber Apo,Mezlûm Dênc û parêzerê serokê Başûrê Efrîqiyayê yê bûrî Nêlson Mandêla, Mehmûd Batêl beşdarî bûn. Wekî din jî wê li ser asta navdewletî konfransek din di navê kampaniya xwe de ya bi azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bang dike, di mehên pêş de hebe û li Libnanê were lidarxistin, li wir bi amadebûna gelek partî , siyasetmedar, Rrêxistinên mafê mirovan û parêzerên hiqûqî jî, wê konferans were nîqaşkirin.

### ‘Têkoşîna me tev ji bo ruxandina pergala Îmraliyê ye’

Endamê Însiyatîfa Azadiya Rêber Apo ya fîzîkî Haşim Hiso di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ew ranawestin heya ku azadiya Rêbertî bedesnexin û wiha got: “Bi vîna bexwedanê ya gelê me, wê Rêber Apo fîzîkî azad bibe û bi bilindkirina asata têkoşînê wê pergala Îmarliyê hilweşe. Em ê hertim li bakur û rojhilatê Sûriyê kar û çalakiyên ji bo têkbirina tecrîda li ser Rêber Apo û misogerkirina azadiya Rêber Apo ya fîzîkî, dewam bikin. Herwiha li ser asta navdewletî jî emê fikr û felsefeya Rêber Apo û girîngiya azadiya wî ji bo civaka Rojhlata Navîn û cîhanê derxin pêş.”

## Lİ ROJHİLATA NAVÎN LÊGERÎNÊN NÛ



Zekî Bedran

Erebistana Siûdî, asayîkirina têkiliyên xwe yên bi Sûriyeyê bilez dike. Li gor tê fêmkirin di vê mijarê de, di nav planekê de tevdigere. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) diyar kiribû ku naxwaze têkiliyên xwe yên bi Sûriyeyê re asayî bike. Tevî vê Siûdî di riya asayîkirina têkiliyan de pêşve diçe. Her wiha nûçeyên ku wê Beşar Esed ji bo Lûtkeya Yekîtiya Ereban were vexwendin jî tên ragihandin.
Di heman demê de tê diyarkirin ku wê Serokdewletê Misrê jî bi Esed re hevdîtinê pêk bîne. Wezîrên wan ên Karên Derve dest bi hevdîtinan kirin.
Me berê jî diyar kiribû, hewldanên Emîrtiyên Ereb a Yekbûyî û Siûdî yên xwe nêzî Sûriyeyê dikin dê bi wan ve sînordar nemîne. Jixwe li aliyê din hevdîtinên Îran û Siûdî bi navbeynkariya Çînê dest pê kiribûn.
Ev trafîka hevdîtinan nîşan dide ku wê li herêmê hevsengiyên nû ava bibin û lêgerîn dewam bikin.
Hewldanên Tirkiyeyê yên ji bo sererastkirina têkiliyên xwe yên bi Îsraîl, Emîrtiyên Ereb a Yekbûyî, Misr û Siûdî re jî didomin. Rûsya hewl dide Tirkiye û Sûriyeyê li dora maseyekê bîne cem hev. Îran jî tevlî vê kirin. Ev tevahî hevdîtin û lêgerîn bi esasî di asta dewlet û
desthilatdariyan û li gor berjewendiyên wan didomin. Ti tifaq û gavên asayîbûnê li ser navê gelan hêviyekê nadin. Ti kes behsa demokrasiyê yan jî pêşxistina azadiyan nake. Ji vî alî ve em nikarin hevdîtin û lêgerînên behsa wan tê kirin, weke nûçeyeke baş pêşkeşî gelan bikin.
Tirkiyê herî dawî di Newrozê de li Cindirêsa di bin dagirkeriyê de ye, mohra xwe li komkujiyeke din jî xist. Têkildarî vê komkujiyê ji Sûriyê û welatên Ereb bertekeke cidî nehat. Dewleta Tirk bi dehezaran çeteyên bi çek li Efrîn û herêmên din dişîne ser gel. Xerabiyeke nehatiye kirin nehiştin. Her wiha sûcekî mîna qirkirinê dikin, ango qewm û neteweyan ji holê radike. Welatên Ereb bi piranî temaşe dikin. Her wiha Qatar û Kuweyt vê qirkirinê fînanse dikin. Dagirkeriya Tirk ji bo
çeteyan û yên ji derve hatine re xaniyan û cih çêdike. Hinek welatên Ereb pereyên çêkirina van xaniyan didin û alîkariyê didin çeteyan.
Dewleta Tirk nafikire ku ji Sûriyê vekişe, vê nake mijara nîqaşê. Ji ber vê yekê neçar man ku bi Esed re hevdîtinê pêk bînin û têkildarî vê mijarê lêgerînên wan ên cuda jî ew e ku wan bike hevkarê polîtîkayên tinekirin û dijmintiya li hember Kurdan. Niyeta dewleta Tirk nîne ku birînên gelên Sûriyê bipêçe yan jî dest ji xerabiyan berde. Rûsya tevî van dizane jî dixwaze Tirkiyê, li Sûriyê mayînde bike. Di şerê Ûkraynayê de xitimîn. Zehmetiyan dikişînin. Bi sedema Tirkiyê tevlî ambargoya li hember wê nebe û ji bo serê DYA-NATO’yê biêşîne, hewl dide Erdogan li ser piyan bigre. Heta dagirkerî bi dawî nebe, her tawîza dide Tirkiyê dê wê xurt bike û dagirkeriyê rewa bike.
Beşar Esed piştî şerekî navxweyî yê pir texrîbkar û hilweşîner çi soz û hêviyê dide gelê xwe? Dema têkiliyên xwe bi cîhana Ereb re pêş bixe, wê gelên Sûriyê çi bi dest bixin? Tiştekî nû yê rêveberiya Esed ji bo demokrasiyê, azadiyan û aştiyê dibêje nîne. Hemû meseleya wê ew e ku wê desthilatdariya xwe çawa xurt bike û ji cihê maye wê çawa dest pê bike. Heke şêwazê rêveberiya berê ji bo berjewendiyên gel û pêşketina gel e, ma ev şerê navxweyî çima derket holê? Eger ne wisa be hingê ma çima ji cihê maye didome? Mixabin ev pirs nayên kirin û çapemeniya di bin kontrola desthilatdariyan de ji bo ev pirs neyên holê tê bikaranîn. Îrade û daxwazên gelan pir hatine paşdexistin. Desthilatdarî û dewletên hatine avakirin mîna qederekê tên pêşkêşkirin. Naxwazin mirov bi awayekî din bifikirin û bikevin nav lêgerînan.
Faşîstekî weke Erdogan li Tirkiyeyê faşîzmê bi sazî dike. Beşeke girîng ê Sûriyê dagir kiriye. Li herêmên dagirkirî her tişta dixwaze dike. Di nav sînorên Iraqê de timî êrîşan pêk tîne û baregehên eskerî çêdike. Di bingehê van êrîşan de dijmintiya li hember Kurdan hebe jî eşkere ye ev lêgerînên berfirehbûnê û avakirina serweriyê ye. Her wiha mijara ku li Idlibê serweriya El Nûsra kiriye nav parastinê û bi dehhezaran çete di bin navê Artêşa Millî ya Sûriyê de rêxistin dike, tenê bi Kurdan ve nikare bê diyarkirin. Hesab û xwestekên wê yên li ser Sûriyê û Rojhilata Navîn jî hene. Eger ne wisa be, ma wê çi karê wê li Lîbyayê hebe? Herî baş welatên Ereb dizanin ku dewleta Tirk di nav şerê navxweyî yê Lîbyayê de ye.
Tirkiyê li herêmê ew qas xerabî kir, îstikrara wê timî kir xeteriyê. Tevî van hemûyan bi awayekî piştgirî ji NATO û DYA’yê girt. Dema wisa bû Siûdî û welatên din jî êdî wê wekî berê guh nedin DYA’yê. Ya rastî wê xwe zêde di nav ewlehiyê de nebînin. Di riya ku hinekan vekirine de wê hinek kesên din jî hewl bidin bimeşin. Niha Erdogan ma bêhtir nêzî Pûtîn an jî Ewropa û DYA’yê ye? Li cîhanê welatê ku li hemberî DYA’yê herî zêde dijbertî heye Tirkiye ye. Ya vê pêk tîne jî desthilatdariya heyî ye. Pêwîst e gelên herêmê van pêşketin û lêgerînan bi baldarî bişopînin, xwe rêxistin bikin û îradeya xwe pêş bixin. Azadî, demokrasî û aştî bi destê rêveberiyên faşîst û despotîk nayê.

FENER



## Gendeliya Hişmendî Metirsîdar Bûye

Idrîs HENAN

Mirov, ango zindiyê bi aqil ku her tiştî li gorî mentelîteya jiyana rast a li ser bingeha felsefeya avakirina vîna azad dijî û civakbûnê diafirîne, dîsa jî bi neyîniya dualîteyên dijber re rû bi rû dimîne. Lew re; pirî caran li gorî hinek şert û mercên objektîf ên ji nişkê ve û yên bi plan çêkirî, kontrola xwe ji dest dide û navenda hişbûyînê têk diçe. Ev jî dibe sersebebê gelek skendal û pirsgirêkên rê li ber herikîna xwezayî yên kar û jiyanê digirin. Bê guman ev yek girêdayî psîkolojiya mirov û rewşa mêtingeriyê ye. Vê yekê tesîrek mezin li rengê têkîliyan jî kiriye ku weke du hêmanên hev û din bandor dikin jî derbasî nava rengê me yê danûstandina fermî bûye. Bi gotinek din; ji ber vê tevliheviya firkirîna di bin bandora zextên jiyana li koçberiyê û tengbûna sînorên diyalogeke sûdwar û nêzîkatiyên otorîter ku her tiştî ji bo berjewendiya tekane bikar tîne û hemû deriyên derexlaqî di oxira serweriya xwe de mubah dike û vedike, hiştiye ku şiklekî nû yê xanedaniyan were avakirin. Li paş perdeya wê biçimê çelûxwar ê xanedaniya mijara gotinê, hişmendiya desthilatdar a dewletdar heye ku giştî di destara takekes de dihêre.
Vê yekê di avakirina kesayetiya heyî de bandorek ecêb çêkiriye ku di asta yekem de têgehên ezeziyê yên çors ên her serkeftineke giştî dispêrin hinek jêderên teng ên gendeliyê afirandine. Ango; gendeliya hişmendî ya bi ferasta rahîbên zîgoratên Sumer hatiye celibkirin, li şûna feraseta kolektîf a berjewendiya giştî ya civakîbûnê esas digire, daye rûnişkandin.
Serweriyeke wisa ya hişmendî bi xwe re herikîne rêgezên exlaq – polîtîk ên civaka dayîka xwedawend xesib kiriye, sînor û sînacên yekdestariyên baviksalarî xêz kiriye. Vê yekê nerîna zayendparêz serwext kiriye û versyoneke çors a prototîpeke hiyarerşîk bi xwe re ava kiriye ku civakê bendewarê zirhêviyan dihêle. Kesayetiya di vê çala homojen de nîgar bûye, ancax kesayetiyek abartebûyî ya ku dizgînbûna exlaqî ji dest daye. Di bingeha xwe de, hêmanên sofîstîk û pêxapînên rûyê rasteqîn ên pêxîrtengiya mirovî ne. Bi gotinek din; rûyên sade û bê maske yên kirêtiya hişmendiya dewletdar in. Karîna herî rast û riya kurt ew e ku mirov buyer, rûdan û encaman rast pênase û binav bike. Ango; kirêtiya ku di encama gendeliya hişmendî de avabûye, ancax otokoleyên hişmendî yên objektîf, weke her karsaziyeke endustiryalê biafirîne. Ev cureya han a mirovê kole, pîstirîn û qirêjtirîn cureyên koletiyê ye. Koleyekî wisa çêdibe ku di nav xeyalên azadiyeke xapînok de dijî û ji her kesê ku li ser wî zilm, zordarî û mêtingeriyê dimeşîne re sîcdeya kor dike. Wisa bêserûber dinoqe çiravên mêtingeriya çandî û dibe aşiqê celadê xwe ku li dijî her bizava dawa azadiya wî bike û hewl bide heqîqetê pê bide nasîn, şerekî bê enam dimeşîne. Xwedêgiravî li dijî keriyê xwe şerê rizgariyê dike, lê mixabin, bê hemdê xwe, bi dilxwazî, bi keriyekî din re koletiya xwe dewam dike. Lew re; nav çi dibe be bila bibe, dixwaze qorocî, ajan, cehşik û xayîn be jî, di encam de; tabloya paralel a gendeliya hişmendî ya metirsîdar e.